KELAYÊN KURDISTANÊ

KELA BALOKA

Mihemed Ebdila Amêdî

Ev kele dikeve rojhelata devera Berwarîbala, ser bi qeza Amêdiyê. Navbera Zêyê Behdîna ji layê bakurî ve û ji layê başûrî ve gundê Baloka ye. Ev kela bilind, ciwan û asê dikeve hindava robarê Zê yî. Di kevin de robar di bin sûrha kelê re dibûre û bi werîsa gelek cara av ji robarî bi amana dihelkêşa bo kelhê her sê rexên wê; roj-helat, bakur û roj-ava, kelaka bilinde û berekê xweristî ye. Demê mirov li ber vê kelê re dibûre, mirov mişe berên tiraşî û birî dibîne wesa diyare ku ji kevin de hemû avahî bûn. Bilindahiya kelhê li hindek ciha pitirî ji 100 m. ye. Li layê roj-helatê û li bin kelê sê şkeft lê hene û rêka kelê ber derê wan şkeftan re dibûre berû başûrî mirov rêka kelê ser dikeve ku hemû peyîskin û dîwarê rêkê hatiye avakirin û mirov lê dizivire ji bo navsera kelê diçe. Li ser rêka wê du berên mezin lê rexê rêkê hene wesa diyare ku dergehekê wê li wê derê bûye. Belê zehmete serkeftina kelê û layê başûrî ve bo kelê delîveka baş heye. Belê ji kevin de bi dîwarekê mezin hatiye avakirin weku hemû kelên dî. Dibe xendek jîlê hatiye kolan ji bo parastina kelê û asêkirina wê. Mîrên kelê ji dijmin û nayar hatiye parastin.

Her wesa kaniya gundê Baloka li layê başûrî ve beramberê kelê dikeve û heger bilintir nebe, av bi boriyên axê (solîna) anîne bo kelê û li roj-helata kelê nêzîkî pira Baloka li başûrê pirê cihekê bilind heye û av li vê derê de dihêt. Dibêjinê sipeyên Baloka.

Avdel Balokî êk bû ji mîrên vê kelê ku av ji roj-helatî înabû roj-avayê berûvajî robarê Zêyî lewma ta noke xelkê devera Berwarîbala dibêjin;" ma tu Avdelê Balokî dê avê jê helînî."

Dîtina kevir û ber û kaniyan vê kela asê bîra mirovî li çîrok, serhatî û evsaneyên kurdî ditîne ve lewma cihekê weku vê kelê li Kurdistanê kêm nimûne ne û li ser demê xwe keleka bi rahavêj û berfireh bûye. Giringiya xwe hebûye navbera her du mîrgehên kurdî: mîrgeha Behdînan (Amêdiyê) li başûrê wê, mîrgeha Hekarî (Colemêrg) li bakurê

wê demê mirov hizra xwe di vê kelê de dike wargehê jiyanê bûye. Sirûşt û dîmenên çiyayên wê robarê wê yê boş rengvedana xemla Kurdistanê ye. Her wesa diyare ku jiyan li vê deverê bi sanahî, bi rê ve çûye. Ewe jî ji ber zeviyên wê yên berfirehe ku her ji kevin de deramet û zewzewat lê hatiye çandin. Dîsa pişbestin bi xwarina goştê masî û koviya, cihekê gelekê başe zor xwedankirina gareşan, terş û kewalî.

Li nav vê kela dêrîn wargehê Babaniya kurda li dewrûberên wê dîwar lê hene û ta evro hindek dîwar lê mane. Li navbera kelê cihê dîwara maye û bi dirûstahî hindek dîwarên qesra mîr Avdel Baloka maye ku dîrokê bo me bi vî rengî, bo me vegêraye: li sala 1078-ê mişextî hevberî sala 1667-ê z, Avdel Balokî êk bû ji mezinên berwariyan ji mîrê Behdînan ve bû û xwe da li gel mîrê Hekariya. Mîrê Hekarê Avdel Balokî kire mîrê wan gundên berwariyan ewên dikevine navbera Hîrê ku dikeve navbera Kanîmasê û çiyayê Kapnêrkî û gundê Orman, Ravîna û Ormedawida heta Baloka û Bêtkar û deştanê. Belê vê çendê gelek nekêşa, mîr Qubad begê siyê mîrê Amêdiyê leşkerek bi serokatiya Gulayî kurê Ebdilezîzî rêkire ser kela Baloka. Gulî leşkerê xwe hêla li cihekê nêzîkî Baloka û ew û kurê wî Xalid û birayê wî Zirav û heft zelamên bijare çûne di nav qesra Avdel Balokî de nawbijiyanê li navbera wî û mîrê Behdînan bike ta mîr Avdel amin kirî ta bûye şev û dinya tarî bû û xelk nivîstî, mîr Avdel; pênc kurên wî û diwazde xizmetkarên wî hemû kuştin. Ji ber vê çendê Qubat begê, Gulî begê kire mîrê berwariyan hejiye bibêjin eve êkemîn mîrê berwariyan bû ji binemala Melkaziya ku nûke bi begên berwariyan navdarin. Gelek stiranên dîrokî bi vê rûdanê hatine gotin û êk ji wan ev çend bendên stirana xwarê ne:

Xan Avdelê berwarî şêrê sore berwarî
Xencer didanê marî çû dîwanê êvarî
* * *
Xan Avdelê simbêl sor şêrê sorê simbêl sor
Destkê xencerê bi mor çû dîwanê çûye jor
* * *
Xan Avdelê simbêl reş şêrê sorê simbêl reş
Destikê xencerê bi nexş çû dîwanê yê kêfxweş
* * *
Li dîwanê nalenal li xîvetê nalenal
Destikê xencerê gopal xan Avdel e Rotemê Zal
* * *
Li dîwanê nirenir li xîvetê nirenir
Destikê xencer bedir xan Avdel e her du kur